Li bîreweriya salvegera rojnamevaniya kurdî Rojnamevaniya me li çi ast e?

Îsmayîl Tahir

Her saleka li ser jiyê karî dibore, ji hemû aliyan ve dewlemend dibe û erşîfê wî mişe dibe û têhin û hêzeka din jê re dibe. Li van rojan kesanên rewşenbîr li Kurdistanê hilkevta borîna 109 saliya derkevtina êkem rojnamevaniya kurdî digêrin û vê hilkevta dêrîna rewşenbîrî di nava civakê kurdî zîndî bike, guman tê de nîne ku ev hilkevte bi çend rêûresmên teşrîfatî û peyvxwandinê dihên saxkirin bê çavxişandinek li çawaniya peydakirina guhorînê yan pêşvebirina astê wê bihê kirin, hilkevtên salên borî bi mixabinî ve em wesa fêr kirine ku ew çalakî yên di vî warî de dihên kirin bi herweçûna dem û şiyan û pareyan e.

Careka bi tinê jî karekê wesa nehatiye kirin xêr û mifayê rojnamevaniyê tê de be, yan jî bibe fakterek ji bo karkirin û pêşvebirina astê rojnamevanan yan jî xurtkirina astê naveroka rojnamevaniyê wek zanist û naverok û pîşeyekê serdemane di vî çaxî de, berî 109 salan demê êkem rojnameya kurdî di dîroka gelê kurd de bi zimanê kurdî derkevtî xwedanê wê Mîqdad Medhet Bedirxan viya libna êkê ya vî pirojeyî dane. Mîr Mîqdad bi hêvî bû bineretê wî di wan kawdanan de danayî li demekê nêzîk yan piştî çend salên din kawdanekê xweş û berfirehtir bi ser gelê wî de were û libna wî ji bo avakirina bineret û binaxekê mukum ji bo rojnamevaniya kurdî avakirî dê avahiyekê bi hêz û berz ji layê naverokê ve jî bihête avakirin, lê bayê heza wî li pey wan hêvî û daxwazan nehat.

Lê xwendineka bi wijdan bo van hinde salên dûr û dirêjên di ser vê rûdanê de derbas bûyin weha dihê berçavkirin ku ew pêngavên heta

niho hatine havêtin heger wek rêje bihê berçavkirin dibe her pêngav bi çendîn salan dihê mezindekirin, yan bi şêwazek din ew tiştê heta niho ji bo xizmetkirina rojnamevaniya kurdî wek naverok hatiye kirin di astê pêdivî de nebûye û negehiştiye nîva yan kêmtir wî karê ji bo pêşvebirina layên û biyavên dîtir hatiye kirin.

Heta niho azadiyên rojnamegerî heta radeyek mezin lawaz in û karekê baş bo nehatiye encamdan, hêza nivîsînan ji bo rojnamevaniyê dihê kirin li astê pêdivî nîne. Dîzayin û çawaniya karî giringî bi naveroka weşanan nehatiye dan, belkû berûvajî, giringî bi bergên rojname û kovaran û bikaranîna wêneyên rengîn û peyvên zîq hatiye dan, gişt weşan ji rojname û kovaran ku dikevin dibin çarçûveya rojnamevaniyê de ji babet û nivîsarên bi hêz û balkêş vala û dûr in.

Rê bi pirbêjî ya hindek nivîskaran û xwedan nexweşî yên derûnî hatiye dan bêraman û dûr ji dorhêlê nihayê civakê xwe bipeyvin û tîvilên rewşenbîriyê bidin wergirî, û serdereriyek sade û sivik li gel xwendevanê xwe bikin mîna bende û nezan serederî pê re bikin, bi navê mêzgerd û raportên nûçeyan û hevpeyvînan pirbêjî yê bikin pitirî ya rûpelên van weşanan babetên lawaz hembêz bikin û pirkirin û reşkirina rûpelan pêvetir çi tiştê dî li rojnamevaniya me zêde nekin û hizareha rêyên nerewa û nepêgîrî pirensîpên yasa rojnamevanî li ber bigirin bo mijûlkirina xwendevanan, rûpelên dirêjên van weşanan bo peyvên hevbir û wêneyên hunermend û semakerên biyanî û nûçeyên bêbiha hatin terxankirin.

Her hevberkirinek di nava rêjeya weşanan de bihê kirin di hemû serdeman de bêguman wê pesend bibe ku destpêka hizara sêyê ango ji sala 2000-ê were rêjeya weşanên kurdî li bakûrê Kurdistanê deh û bîst qatî qûnaxên pêştir mezin û berfireh bûye, lê astê wan û hêza wan her Xwedê alîkarbe, demê takê kurd meziniya xwe nîşan dida ku weşanek di dest de ye ji cihekê dûr bi dest xistiye naveroka wê çi qas xurt û hêja û pirî raman bû? Lê li gel berfirehbûna rêjeya weşanan mixabin astê hizrî yê naverokê belans ber bi nizmî şikand û her tak dikare bi demekî kêm çend weşanan bixwîne.

Lê dem maye û delîve li kare heger em bixwazin astê rojnamevaniya Kurdistanê ber bi pêş bibin û karekê baş û rewa tê de bikin û pêngava here bi lez û karîger jî ew hejmara van weşanan kêm bibe, hindekên din têkda bibuhijin, karmendên ne li ast li ser çi van destgehên weşanan çi kovar yan rojname nehên sepandin, radeyekê guncayî bo karî bihê terxankirin, delîve ji bo berhemên astnizim nehê dan di nava van kovar rojnaman de cih bigirin, belku bibe sedema bicîhatina xewin û heza xwediyê êkem rojnameya kurdî di dîroka hevçerxa gelê kurd de.